NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988





Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(77) | B.Çile | 2007 z-2619 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|

# Tirs û çavsoriya rijîma Be'is li derbarey Danezana Şamê

Piştî lidarxistina kongira berfireh a Encûmena niştîmanî ya Danezana Şamê - Îlan Dîmeşq – a rikebir û ji roja 10.12.2007-an de – roja cîhanî ya mafên mirovan – karbidestan li seranserî Sûriyê û li derve , bi gelek hawan dest bi hêrişên berçav û yên neberçav kirin û hê berdewam in , bi hêviya ku karibin vê piletforma demokratîk û pireng ji hev bixin , kar û barê wê belawela , beravêtî û rûreş derînin .

Di derheqê endam û rêvebiriya Encûmenê de , bi hêrs û çavsoriyeke balkêş pêla girtinên keyfî serî hilda , gelek camêr avêtin binê zîndanan û hê girtî mane , weke: 1-Seroka encûmenê xanima hêja Dr.Fida Elhoranî . 2-Nivîskar û çalakvan Ekrem El-bunnî . 3-Dr.Ehmed Tu'imê 4-Nivîskar û siyasetvanê navdar Elî El-Ebdulla . 5-Dr.Welîd El-bunnî . 6-Dr.Yasêr El-Îtî .
7-Mamoste Cebir El-Şofî .
8-Rojnamevan û nivîskar Fayêz Sara .
9-Mamosteyê Endezyar Mihemed Hecî Derwîş.

Ji bilî bi dehan kes yên ku karbidestan ew birine û anîne , hinek çend se'etan , û hinên dî şevekê li ba xwe hêştine , ji nêv wan birêz Raşid Setûf, Xessan Necar, Ûseme Aşûr, Xazî Qedûr, Semîr Neşar, Îsmaîl Omer, Îsmaîl Mihemed, û gelekên dî.

**Çêrok çi ye ?**

Çêroka vê pêvajoyê , ango rastiya pirsê ewe ku , li 1.12.2007-an li derdora Şamê , cara yekemîn bû ku li hundirê Sûriyê , nûnerên gelek hêzên siyasî , komîteyên civaka sivîl , rewşenbîrên demokrat , kesayetiyên serbixwe û bi beşdarbûna nûnerên partiyên Kurd yên **D.R.( 11 )**

www.arsivakurdi.org

## Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

### Civateke Taybet

**Li** gorî rêbaza partiya me, di navîna Ç. Paşîn de, bi beşdariya hemî nûnerên herêma( Kobaniyê, Reqê, Heleb ,Kudax û endamên komîta têkliyan) , civata KADIR li darket. Mijara civatê li ser " rol û karê partiya me di nav tevgera Kurd e bû.

Piştî sekretêrê partiêyê xêzên herî berçav û naskirî yên partiyê,di hemî waran de û bi taybetî ji bo lihevkirin û yekîtiya tevgera me ya Kurd dane xuyan. Civat bi hesteke berpirsiyar li ser wê mijarê rawestî û hemiyan nêrînên xwe pêşkêş kirin . Li dawiyê berhemên civatê ev bûn:

hemî kar û bar ji girêdana kongirekî Kurd re li Sûriyê, bi beşdariya kesên serbixwe .

Guhdan ji bo pêşxistina Hevbendî.

Danûstandina bi tevgera me re, xalên lihevkirinê, bi nivîskî li hevalan bên belavkirin.

Guhdana têklî bi gel û bi taybetî bi nivşên nû û warê ragihandinê re.

Guhdana pêşxistina têkliyan bi hêzên ragihandina Şamê re.

## 2-Bûyereke dilêş

**Di** riyên çûn û hatinê de, ji ber gelek sedaman mîna şaşiyên mirovan, neduristiya tirmbêlan û sir û seqayê, gelek bûyerên hatûçûnê(trafîkê) çêdibin, , di encam de, gelek ziyanên mezin derdikevin.

Lê ev bûyera ku em li ser daxivin gelek dijware, heft kes ji yek malbatê cangoriyên wê ne.

Di sibeha 8/12/2007an de,li ser riya Qamişlo – Hisiça, pasek ji kompaniya Qedmûs li vaneke girtî dixîne. Van, ya malbata Şêx Elî ji gundê mistefawiyê, devera Dêrikê ye. Mixabin di encama wê de, 7 kes ji yek malbatê jiyana xwe ji dest dane ew jî: Cemal Seyid Mehmûd û pîreka wî Gulçîn digel pênc zarokên wan bûn, 2 kes jî birîndar bûn .

Evê bûyerê, şîn û xemgîniyek mezin berda dilê hemî xelkên wê deverê .

Bi navê weşana NEWROZ em sersaxiyê didin xelkên deverê û malbata wan. xwedayê dilovan aramekê bide wan û bila buhişt cîwarê her heft kesan be, xwedayê dilovan, saxlemî û tunduristiyekê bide herdu birîndaran.

7/1/2008

*-**Li** 3.1.2008z- 2619k ,li Cindirêsê , mamoste Memê Alan endamê saziya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Sûriyê , li ber roniya armanc û biryarên saziyê , şevek- li ser pêwîstiya bikaranîna zimanê kurdî di nav hemî beşên civaka kurdî de - li darxist . Herweha dora 25 xort û keçên nûgihayî bi beşdarbûn û pirsên xwe , ew şev bedew û dewlemend kirin .

*- **Li** Efrînê , gundê Qermîliq , di 29 . 12 . 2007 an de , Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , komcivînek rêzanî li ser giringiya têkelî û danûstandina Tevgera Kurd bi hêzên niştimanî yên rikber re ( wek mînak : Ragiyandina Şam) , û avakirina lêvegereke Kurd di riya kongireke kurdî re , li darxist . Dora çel kesî li komcivînê beşdar bû . Wan jî bi wê beşdarbûnê û pirsên xwe , kêr û sûdên wê komcivînê zêde kirin.

www.arsivakurdi.org

# Pirtûkin nû

Pirtûkin nû

*

## ŞIYÊ

Li vê dawiyê, mamoste Deham Ebdilfetah, hin ji helbestên helbestvanê bi nav û geng, Hamid Bedirxan, yên bi zimanê Kurdî, di pirtûkekê, di bin navnîşana **ŞIYÊ** de weşandin. Pirtûk li çapxana Amîral-Beyrûtê çap bûye û ji 120 rûpel û 41 helbestan -bilî diyarî û pêşgotinê- pêkhatiye. Di vê hejmarê de, emê hin perçeyên bijarte, ji helbesta **ŞIYÊ** ji xwendevanên **Newrozê** re biweşînin:

**ŞIYÊ**
**Kulîlkek ji gulîstana welêt e !**
**Gul e, geş e ..**
**.Şiyê ye**
**Sînorê ronahî û tariyê ye**
**Av e,**
**Ava kaniyê ye...**
**Şiyê jîn e, mizgîn e...**
**Geh hişyar e**
**Tim dîn e**
**Bi birîn e...!**
**Hilm e .... bîn e**
**(( Birca Belek)) a torevana ye,**
**li ser rêka nemirinê ye,**
**behişta dilan daniye.**

*********************************************

****Pirtûk: Ehmedê Xanî**
**Nivîskar: Heyder Omer**
**Çapa yekem: 2007**
**Qab: Xelîl Ebdulqadêr**
**Derhêner: Emîna Osman**
**Weşanxane: Hîro**

((ev pirtûk bi alîkariya dezgeha SEMAKURD ya çand û hunerê hat weşandin- Dubey – Îmarat AlArabiye))

Ew pirtûk li dawiya sala 2007 an biderket. Ew pirtûkeke lêkolînî ye, mijara wê destana Mem û Zînê ye. Li sala 1997an hatiye nivîsandin, û piştî deh salan hat çapkirin.

Pirtûk ji 110 Pelên ji pîvana orte pêk tê. Ew bi çapeke xweşik li kaxezên zor baş derhatiye.

Pirtûk ji sê beşan pêk hatiye. Li dawiya wê ferhengokek biçûk jî heye. Dr. Ebdilmecîd Şêxo jî pîşgotineke zor li bejna wê hatî jêre daniye.

Nivîskarê berêz H. Omer desteya Mem û Zînê bi zimanekî xweşik û bi hestên pir nazik dipelîne û dîsa cewherên nû û ciwan jê dertîne. Birastî pirtûk hêjayî xwendinê ye.

***

**Çavrêbûn**
**Merwan Berekat**
**Hejmara weşanê: 1000**
**Çapa yekem: 2007**
**Qaba pêşîn: Burhan Ebdî**

**Çavrêbûn** dîwaneke helbestê ye. Dîwan bi pîvana orte hatiye weşandin. Ew ji 108 rûpelan pêk hatiye. Helbestvan M.Berekat, hestên xwe yên zor nazik di riya 37 helbestan re tê rêtine. Ew bi wêneyên xweşik û hevokên li saz, di ezmanê helbestê de bilind firiye. Hemî cureyên helbestê di guldanka Çavrêbûnê de bêhn didin.

www.arsivakurdi.org

# NAMAK VEKIRÎ

**Rêz û silav ji hemî xwendevanên vê namê re ……….!**

Weke çawa gelên Kevin li gor zanîna wan bi stêrnasînê , her yekî an hinekan ji xwe re rojmêrek danîn wek , rojmêra rojê , heyvê , heyvûrojê û guhêrek .

Herweha gelên Mezopotamiya jî mîna Kasî , Somerî û Babiliyan jî hindiktirîn 2000sal B.Z rojmêr bi kar anîn .

Ji Medan vir ve Kurd jî rojmêrê bi kar tînin . Weke em dizanin rojmêr yan ji destpêka dîrokekê, yan jî , ji destpêka olekê destpêdike . Vêca gelê Kurd jî , ji xwe re du bûyerên dîrokî ji bo rojmêra xwe nîşan didin .

Dîroka yekemîn : Damezrandina serdariya Medan B.Z ,lê wek xuya dibe li ser yekîtiya Medan sê dîrokên cuda ( 653 , 649 , 700 B.Z) bi kar tên.

Dîroka duyemîn : Roxandina paytexta Imperetoriya Aşûriyan Nînewa ji aliya Medan ve 612 B .Z .
Ji ber wê , îro ji bo rojmêra kurdî , du nêrînên sereke hene û li gor wan du nêrînan , du rojmêr jî bi kar tên .

Wek em dibînin ku , bikaranîna dîroka roxandina Nînewa , paytexta Aşûriyan bi destê Medan sala 612 b.z wek destpêk ji dîroka Kurd re , ji dîroka damezrandina serdariya Medan 649 , 653 , 700 b.z . rastir e , û bêtirîn cî digire .

Çimkî ji alîkî ve piraniya Kurdan , partî , rewşenbîr, nivîskar , rojname û kovar li bakur , rojava , başûr û rojhilat 612 B.Z bi kar tînin , û hindik ji Kurdan li başûr û rojhilat û bi taybetî Kurdên soran 700 B.Z bi kar tînin .
Ji aliyê din ve jî , dîrokzan li ser dîroka damezrandina serdariya Medan li hev nakin . Yanê weke li jor diyare , ew sê dîrokan bi kar tînin .

Li dawiyê banga me li hemî partî , komele û dezgehên sêvîl û fermî , rewşenbîr , dîrokzan , nivîskar …H.W.D , ku li banga me xwedî derkevin , lêkolînên pirjêder li ser vê mijarê çêkin û dest bi guftûgoyan di dermafê wê de bikin , ta ku , em çarakê ji vê cudekaranîna dîrokî re bibînin , û yek rojmêrê bi kar wînin .
Sipas ji guhdariya we re

2619K- 2008Z
Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurd li Sûriyê
S.F.P.Z.K.S



Cejin û Sersala we Pîroz be
2008

www.arsivakurdi.org

# Çima Bênezîr Boto?!

Dîlan Zivingî

Li ev çend salên dawîn , bêtirî her demeke dîtir , Rojhilata navîn hêmenî û hevpîvan nedîtiye , xelkên wê di heyama bivetî û tirsê de li ber xwe didin , yanê Rojhlata navîn bûye devera şer û cengan. Ji ber ku , mafên



mirovan li gel rêjîm û sîstemên rojhilat binpê û tune bû ye . Ji doz û pirsgirêka gelê Kurd ve bigire ta ya Felestînî , di Îraq , Libinan û Avxanistan re derbasbe ta bigehe Pakistan , ew bûne cîgehên kul û derdan. Hin destên mezinan hene , berjewendiyên wan ên teng û pir bi kirêt dihêlin bêçare bimînin . Lewre jî, rûdawa nezanî, dijatî , xizanî û kuştinê bêtir li van deverên me li jor bi nav kirine hertim yê gol û hewş vedin . Destên hêzên reş û teror serî hildane û çi li vir û çi li wir bi dehan mirovên xwedî bîrûbawerî, bi kemberên peqok û turmbêlên bombekirî ew têne kuştin . Heyf û pir mixabin ku , ew jina bîrbir , dilêr û jîrek , di -27-ê 12 an sala 2007an de, xanim **Bênezîr Boto**, bi xinzî bi destên terorîzimê dihate kuştin!. Dawîsala 2007an û sersala 2008 an, li ser xwediyên wê û gelê Pakistanê bi êş û jan derbs dibû ! Ma gelo çend jinên mîna Bênezîrê li ba dewletên Rojihlat hene?!. ,Wê bêtirî carekê , bi serbilindî weke serokwezîra Pakistanê cî girtibû. Bêgûman ew bi xebat û dilsoziya xwe ve , hêvî û vîn di dilê her keç û jinên Rojihlat de geş û bilind dikirin û bi pêdarî û xebata xwe ve nîşan didan . Herçiqas pêwîste jin li maf û rola xwe xwedî derkeve. Ne jî dest girêdayî li rewş û pirsgirêkan weke , li pir waran dixuye ! temaşe bike . Min dil heye , di helwestên mîna vê de , gotina pêşiyên me Kurdan bînim zimên : "Şêr şêr e çi jin çi mêr e". Xanim Bênezîr Boto, keça Zolfeqar Elî Boto ye, sala -1953.an ji dayîk bûye û li Birêtanya xwendina xwe ya bilind , beşê zanista siyasitê kuta kiriye. Piştî wergera desthilatê ya li serê bavê wê weke serokê Pakistanê, wî digrin û bidarve dikin . Xanim Bênezîr bi soz û peyman sund dixwe ku , ewê heyif û tola bavê xwe yê hilde û dê bi rêk û pêk xizimeta gelê Pakisitanê bike . Lê mixabin ew jî dihate kuştin . Bila serê zarok , malbata wê , gelê Pakistanê û hemû berketiyên wê sax bin , bêgûman Bênezîr Boto yê herdem di hiş û ramanê her mirovekî xwedî bîrûbawerî de zindî bimîne. Li dawî hêjayî gotinêye , em ji xwedevanan re diyar bikin , ku Xanima me Bênezîr Boto, ji dapîreke Kurd , ji Kermenşahê ye. Ew dapîr li Necefê bi kalpîrê Bênezîra me re zewcî , paşê çûn Pakistanê. Erê bênezîra me , di nûgihaya xwe de, bi porê çîl û nêrîn û helwestên rastgo ji hevsiyan ve diyar dibû , ku kurdîtiyê tê de reng vedane .

www.arsivakurd.org

# Têgihîna Namûsê

İsmail Beşikçi
(Wergêr: Roşan Lezgîn).

Li bajarên Kurdan ên mîna Bidlîs, Agirî, Batman, Diyarbekir, Ruha, Wan û Mûşê kuştinên ku wek kuştinên namûsê, wek kuştinên edetan tên binavkirin, çêdibin. Ev kuştinên hanê di encama koçberîyê de êdî li bajarên wekî Stenbol, Adena, Antalya, Mêrsîn, Îzmîr û Sakaryayê jî çêdibin. Li van deveran têgeha namûsê di ser bedena jinê û zayendiyê re tê nasandin. Namûs di ser beden û zayendiya jinê re tê fêmkirin. Di nav malbatê de jinên ciwan yan jî keçên 15-20 salî li gundan yan jî li navçeyan ger bi awayekî nehînî ligel mêrekî di nav peywendiyê de be û ev peywndî ji layê malbatê ve bête bihîstin, hingê malbat vê yekê herwekî "namûsa me herimî, divêt bê paqijkirin…" têdigihê, wisa fêm dike. Dibe ku ev peywendî bi zora mêrî jî çêbûbe. Aşkera bûyîna peywendiyê jî, pirranî bi hemîlebûnê re derdikeve meydanê. Malbat, ji ber ku leke li şerefa malbatê daye, hingê di vî warî de biryara kuştina keçikê didin û vî karî jî yan bi destê birayê piçûk yê jinê/keçikê, ger birayekî wisa nîn be, bi destê birayê mezin yan jî pismamekî wê didin kirin. Mezintirîn tundrevîya li hemberî jinê bi vî awayî tê pêkanîn. Herwisa, ev jî têye zanîn, ew malbatên ku karên wisa dikin, di nav civakê de qedrê wan zêdetir dibe.

Televîzyon, rojname û radyo dema ku nûçeyên bi vî rengî belav dikin bal dikşînin ser meclisa malbatê: "Meclisa malbatê civiya. Bona paqijkirina vê lekeya li ser malbatê û bona parastina şerefa malbatê biryar hatiye dayîn ku ew jin yan jî keça ku di nav peywendiyên nehînî de ye, bête kuştin."

Li gund yan jî li navçeyê ger destê mêrekî li porê keçek yan jî jinekê bikeve, ev yek dibe meseleya namûsê. Bûyereka wisa dikane bibe destpêka şerekî xwînî. Layekî vê diyardeyê ev e. Lêbelê layekî din yê dîyardeyê jî heye, ku tê zanîn, lê behsa wê naye kirin, diveşêrin. Her kes pê dizane lê ji nedîtî ve tê. Di vê gotarê de ez ê hewl bidime xwe da ku piçek bal bikşînim ser vê yekê.

Di herêma Kurdan de ji sala 1984an û vir ve, ev serê 25 salan e şer heye. Hêzên asayîşê hertim li gundan, li navçeyan operasyonan dikin. Carinan, jin û mêr û ciwan û pîr, giş bi hev re bi komelî têne girtin. Kesên ku têne girtin, carinan bi zincîran bi hev ve têne girêdan û wan dibin polîsxane yan jî meqerên leşkerî. Li van deran, hêzên asayîşê, jinên ciwan ji yên pîr cihê dikin û wan li cihekî din girtî dihêlin. Di lêpirsînê de ligel îşkenceyê tecawuz (destdirêjîya namûsa jinê) jî heye. Di vê prosesê de korucî (cehş), endamên JİTEMê, tîmên taybet (quwetî xas), cendirme, polîs û leşker bi darê zorê namûsa jinan diherimînin. Mêrên ku hatine girtin, ango bav û bira û mam û H.W.D. hay ji rewşê hene. Lêbelê li hemberî tiştên bûyî bêdeng in. Ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştek wisa çênebûye. Ew meclisa malbatê ku li gund, li navçeyê ji ber peywendiyeka li derveyî edetan dikane derbareyê jinan de, derbareya keçan de biryara kuştinê bide lêbelê li hemberî wê herimandina namûsê ku li meqera leşkerî ji layê hêzên asayîşê ve çêbûye bêdeng dimîne

.D.R (7)

www.arsivakurdi.org

Ger destdirêjiyeka wisa ji layê hêzên asayîşê ve çêbûbe, ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştekî wisa çênebûye. Ger li gund, li navçeyê, li bajêr ev peywendî bi yekî ji gelê wan re çêbûbe, hingê dibêjin "namûsa me herimî, tenê kuştin dikane viya paqij bike", Lêbelê ger ev destdirêjî ji layê endamekî hêzên asayîşê ve bête kirin hingê nabe mesele. Ew mêrê ku dibêje namûsa me herimî û bi xwînsarî gule berdide xwişka xwe, qet bala xwe nade ser pêvajoyeka wisa, li ser vê yekê nafikire. Dîyardeya namûsê çawa ku li gorî cih û zemanê ku bûyer rû daye diguhere, herwisa, li gorî nasname û pîşeya mêrî jî diguhere. Divêt ev peywendî, ev têgihaştin bi têgehên antropolojîyê bêne fêmkirin, bêne têgihaştin û rexnekirin.

Meclisa malbatê sazîyeka pîrîmîtîv e. Wekî mînak, di warê rêvebirina debara malbatê de, di warê kirîn û frotinê, yan jî bo kirê dayîna milk de biryareka meclisa malbatê tune ye. Bona biryarên ekonomîkî ti pêwîstîyek bi meclisa malbatê nîn e. Derbareyê arîşeyeka aborîyê de nayê gotin ku "malbat civîya û biryareka wisa girt" û H.W.D. Wezîfeya meclisa malbatê tenê ew e ku derbareyê jin yan jî keçekê de bi mebesta ku li derveyî edet, dab û nêrîtan peywendî bi yekî re danîye biryara kuştinê bide… Ji bilî viya tu roleka wê nîn e. Dema ku çapemenî dibêje "meclisa malbatê civiya", "meclisa malbatê biryar da" hingê ev yek ji bilî ku vê meclisê zinde bihêle ne tu tiştekî din e. Ger mesele were ser pirsa Kurd, hingê ev sazîyên kovî yên wisa ji layê dewlet û hukûmetê ve, ji layê çapemenîyê ve berevaniya wan tê kirin, wan teşwîq dikin. Statu didin van sazîyên kovî, wan geş dikin, pêşde dibin. Û bi vî awayî dikin ku ev sazî xwe birêxistin bikin, mayînde bibin. Wekî mînak, di zivistana sala 1990î de hindek serekên korucuyan (cehşan) bo Anqereyê hatibûn vexwendin. Ligel wezîrê navxweyî û serekwezîr û serokkomarî hevdîtinan çêkiribûn. Wê demê jî çapemenîyê wisa nûçe belav kiribûn: "Serekê eşîra Batûwan …, serekê eşîra Tayan …, serekê eşîra Jirkî …, serekê eşîra Mexmûran … li Anqereyê ne. Ev serekên eşîran ku li ser vexwendinê hatine Anqereyê …" Li televîzyonan bi tevî dîmenên wan ve bername hatibûn çêkirin. Bi vî awayî dezgayê eşîretîyê hatibûn zindekirin, hatibin parastin û geşkirin, hewl dabûn xwe da ku statu bidin van dezgayan. Di proseya berxwedanê de bi destê polîtîkaya dewletê eşîret wekî dezgayek hatibûn rêxistinkirin. Lêbelê ji layê din ve serokwezîr Bülent Ecevitî di dema serokwezîrtîya xwe de destûr nedabû şaredarên HADEPê da ku werin pirsgirêkên xwe rabigihînin wî. Ecevitî bi mebesta ku "ew xwe ji rêxistina terorê dûr nagrin" jîvan nedabû wan.

Ez dixwazim bibêjim ku çapemenî têgeha meclisa malbatê derdixîne pêş, hewl dide xwe da ku statuyekê bide vê dezgeya prîmîtîv, bi baldarî dixwaze vê diyardeyê bike sazîyekê. Gelo ev meclisa malbatê dikane biryarek wekî "di girtinên komelê de em naxwazin jinên ciwan li cihekî din girtî bimînin, wan ji komelê veqetînin û bibin cihekî din, em qebûl nakin ku ew li cihekî din girtî bimînin…" bigrin?. Dikane biryarek wek "em ê jinên xwe **D.R (8)**

www.arsivakurd.org

nespêrin bextê wan…” bigre? Nikane wisa bike. Lêbelê di bûyerekê ku li gund yan jî li navçeyê rû daye, dikane tundtirîn zorbazîyê li jinan bike, qet texsîr nake ku girantirîn cezayê ango cezaya kuştinê pêk bîne. Di têgihîna namûsê de, di têgihîna “namûsa me herimî” de, li gorî cih û zemanê wê, li gorî nasname û pîşeya mêrî cihêtîyên mezin nîşan dide. Divêt meriv bi teferuat li ser sedemên vê yekê raweste. Herwisa, di vira de şaşîtîyek jî heye. Gelo divê meriv li kû derê li vê şaşîtîyê bigere? Gelo divê meriv di nav edetên civakî de li vê şaşîtîyê bigere yan di wê texrîbata ruhî de ku di encama mekanîzmayên zordarîyê yên hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan xistine bin kontrolê pêkhatîye de bigere?

Kurd civakeka wisa ne ku nikanin xwe bi rê ve bibin, rê nayê dayîn ku ew xwe bi rê ve bibin. Kurd û welatê wan Kurdistan hatine cihêkirin, parçekirin û parvekirin… Rewşa kolonyalîzma navneteweyî serdest e. Di navîna Rojhelata navîn de 40 mîlyon kurd bê statu ne. Hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan îdare dikin, gelek xirab îdare dikin. Di vê îdarekirinê de heq û huqûq tune ye; pelaxtin heye, piçûkxistin heye. Li cîhanê ti miletekî din ewqas mezin û bê statu nîn e. Helbet em hay ji pêşveçûnên ku, li derdora Dewleta Federe ya Kurd kû li Kurdistana Başur çêdibin hene. Herwisa, ev jî têye zanîn ku ev yek piştî çendîn berxwedaneka dûr û dirêj û dijwarîyan de çêbûye. Ew hewldanên xwe îdarekirinê ku li parçeyên din yên Kurdistanê rû didin, ji layê hêzên ku bi awayekî hevpar Kurdan îdare dikin ve têne fetisandin. Ger bêhtirî sed salan ev proses li dar be, hingê dibe sedem ku di warê edetên civakî û tenduristîya ruhî de gelek xirabûn derkevin meydanê. Psîkolojîya/derûnîya kesan, ya civakê xira dibe. Civak û kes êdî ji xwe dûr dikevin, dikevin nav prosesa tevlîbûna wê kultura ku li ser wan hatiye sepandin/empozekirin. Ger ev proses demeka dirêj dewam bike, dibe ku ev yek êdî bikeve nav DNAya meriv û civakan. Ewên ku dikanin li hemberî gelê xwe gelek tund bin lêbelê li hemberî hêzên dagîrker, li hemberî kesên ji wan hêzdartir fis dibin. Ev reftarîyên berovajîyê hev, ku di meseleya namûsê de derdikevin meydanê, di wateya rizandinê de ne. Dema ku civaka Kurd, nirxên kurdan bi vî awayî di bin fişardinê de bin, hingê psîkolojîya wan jî xira dibe, rizandineka wisa derdikeve meydanê.

Gelo riya rizgarbûna ji van peywendîyên lanetî, riya rizgarbûna ji vê prosesa lanetî û xwe dirêjî azadîyê kirinê, çi ye? Berîya her tiştî gelek girîng e ku divêt meriv hay ji vê prosesê hebe, ji van peywendîyan agahdar be. Ew kesên ku hay ji vê prosesê bibin, gelek aşkera ye ku dê bi nirxên xwe re bijîn, dê xwedîtîyê li nirxên xwe bikin, dê van nirxan geştir bikin, dê nirxên ku li ser wan hetine sepandin/empozekirin red bikin, her ku biçe dê vegerin ser resenîya/orîjînalîteya xwe. Piştî ku meriv bibe ‘xwe’, hingê gelek hêsan e ku meriv bigihê mafê xwe, qet nebe di fiîlîyatê de meriv dê bibe xwedîyê mafên xwe. Ev prosesa lanetî, ev peywendîyên lanetî tenê dikanin bi vê yekê bişkên.

Zarathustra News & Peyamaazadi.org - zarathustra_news@comhem.se

www.arsivakurdi.org

# *Bila bîranînên giranbuha vala derbas nebin*

**Memê Alan**

- Piştî germtirîn rêz û silav ji pakrewanên rewşenbîriyê û peyva azad û ji nav wan , ji lehengê nemir Dr . Nûridîn Zaza re …

Pêwîste em di bîranîna îsal a Nûredîn Zaza de , em
jiyana wî ya tijî çalakî û xebatên curbecur di ber çavan re bibin û wînin û sûdan jê werbigrin .

Mirovên di jiyana xwe de mezin bin , herweha di mirina xwe de jî mezin in . Vaye ev merovê ku , em wî bi bîra xwe tînin yek ji wan mirovên gewre ye .

Çimkî ew di raman û helwestên xwe de li pêş hevdema xwe bû . Ew di hemî warên jiyanê de , mirovekî dûrbîn bû , û xwedî kesayetiyek rêzanî û ramangîrî xuya bû .

Vêca pêwîste ku , em çend nimûnên balkêş ji nêrîn , raman , rol û sinciyên wî ji xwendevanan re bînin zimên :

* Dr . N.Z , ji bo rewşa gelê Kurd û çareserkirina pirsa wê li Sûriyê , avakirina rêxistineke rêzanî pêwist didît . Wêlomê jî rola wî di avakirina pirograma rêzanî ya yekemîn partiya Kurd li Sûriyê , sala 1957 an de , serekîn bû .

* Baweriya wî bi guftûgoyê , bona çareserkirina kêşe û pirsgirêkan hebû. Wêlomêjî wî herdem û berdewam doza danûstandinê û lihevkirinê di nav gelên herêmê de dikir . Û digot : Riya tewrî rast û durist bo çareseriya pirsa Kurd li herêmê , riya danûsatandinê ye

*Hezkirina wî ji hemî zimanan re , lê , bêtirîn ji zimanê Kurd re . Ji ber ku , wî hebûna gelê Kurd di hebûna zimanê dê de didît .Û hêviya wî ew bû , ku gelê Kurd bi dev û diranan , û bi her awî , zimanê xwe yê şêrîn û bedew biparêze û wê fêrî zaroyên xwe bike .

* Ew di warê çand û toreya kurdî de , rewşenbîr û ramangîrekî mezin bû . Ji ber ku , wî didît çand û tore stûnek ji stûnên hebûna gelan in .

* Nûredîn Zaza di nêrîn û helwestên xwe de , mirovekî wêrek û dilêr bû , lê ew nêrîn û helwest pîvayî , li gor heyama heyî û ne rêzderbûn û bi vê pîvan û dûzanê , wî sala 1960î , di zîndanê de , li pêş dadgehê rastiya hebûna gelê Kurd û zimanê wî weha pêşkêş û diyar kir :
Hebûna gelê Kurda li ser axa xwe , di çarçewa komara erebî ya yekgirtî de , li rex birayên xwe yên Ereb , rastiyeke dîrokî ye . Ev gel xwedî ziman û folklorekî taybet e , pêve hatî girêdan û bingehên wê parastiye .

Aniha jî em di hevdemek ji jiyana mirovatiyê de ne , hewil tê kirin ku , alîkarî û lihevkirin di navêna gelan de çêbibe , da ku , jiyana mirov baştir û xweştir bibe , aştî peyda bibe , û mirov bi rûmeta xwe ya mirovatiyê bêtir hest bibe . Û di dermafê ziman û folklora Kurd weha got :

Tucarî rojekê ji rojan , pêgirtina gelê Kurd bi ziman û folklora xwe , nabe jêderek ji jêderên hevcudatî û nakokiya Kurd û Ereban . Herweha di baweriya **D.R.(10)**

www.arsivakurdi.org

# Kesên ku wekî min nafikirin bizin in

Ji dema ku Ehmedî necadî bûye serokê komara Îranê, ji ber nezanî û çand û kultura xwe ya kêm û lawaz, berdewam tiştan diqewimîne ku gotinên wî pir



ecêb û balkêş in. Vê dawiyê, serok komarê Îranê Ehmed Nicadî, di dema serdana xwe bo parêzgeha" Xorasana başûr", di nav xelkê de diaxive û ji ber ecêbûna gotinên wî medya û çapemeiyan, beşek ji wan neweşandin. Wî dema ku di nav xelkê bajarê Bîcendê de, diaxive, bi awayekî tund rexne ji neyarên xwe û bi taybetî kesên ku bi awayekî ronakbîrane dijberyê tevî siyasetên wî dikin, bi bizn nav dike û dibêje "

***Kesê ku wekî min nafikirin bizin in***

***Rojnama AGIRÎ Hejmar 75***

**Dumahk** :***Bila bîranînên***

me de nejî di navbera Kurd , Turk û Farisan de jî . Ji dêvla wê , bikaranîna zimanê kurdî zengîn û rengîniyekê dide çandeyên van welatan .

Weke çawa ev mirov , di jiyana xwe de mezin bû , xuya ye , ew di mirina xwe de jî mezin e . Mezinbûna wî salê carekê me li hev dicivîne . Mirovên weha di jiyana xwe de mezin , xuyaye mirov nikare di mijarekê û dudiyan de baş li ser jiyana wî ya curbecur raweste û mafê wê bidiyê û têr bike , û nejî dikare baş kêr û sûdan ji şevêntêne girêdan werbigire .

Ji ber wê , pêşinyara me ji komîta Munteda Nûridîn Zaza re , ewe ku , ji vir wêve şevên bêne lidarxistin carê di bin navnîşaneke bêlikirî de , li ser warekî ji warên jiyana vî camêrî ya giran buha be .

*******************************

## 36 salî ye û diya 13 zarokan e

Jina Înglîz ya bi navê Joanne Watson zarokê xwe yê 13'mîn anî cîhanê. Tevî ku ew diya 13 zarokan e jî, lê belê hîn weke keçeke ciwan tê dîtin. Rojnameya înglîzî Dailymail di malpera xwe de nivîsand ku temenê Joanne 36 salin û berî hefteyekê bû diya 13'mîn zarok. Mêrê Joanne Watson, John jî 42 salî ye.. Ji wan 13 zarokan 10 keç in. Watson, 46 kîlo ye.



*******************************

# Sersala we Pêroz Be

**Bi hatina serala 2008 an, komîta rêvebir a Newrozê hemî milatên cîhanê û taybetî a miletê Kurd pîroz dike û bi hêviya saleke azadî û wekhevî ji tevan re be .**

www.arsivakurd.org

**Dumahk: Tirs û çavsoriya**.........

(Ber û Hevbendiyê) , karîbûn bi hevre kongirekî xwe lidarxin , û di bin navê Encûmena Niştîmanî ya Piletforma (Danezana Şamê – Îlan Dîmeşq) xwediya dirûşma: Ji bo pêkanîna guhartina demokratîk a aştiyan de , li ser hinde belge rawestin û erê bikin . Herweha kongirê karîbû pirograma karûbarê xwe bi serkeftî bibira serî û rêvebiriyek ji xwe re helbijarta .

Hêjayî gotinê ye ku endamên kongirê ji hemî parêzgehên Sûriyê hebûn , vêca ji bilî , Heleb , Şam , Latqiyê , Hums û Hemayê , ji Swêda û Der'a de bigir ta tu bighê Reqê , Dêrazorê û Hesekê…hwd.

Li hêla dî, di civata Encûmenê de , bi dehan camêr hebûn , yên ku her yekî ji wan , bi neheqî bêtirî 10-15 salan ji jiyana xwe di zîndanan de , di paş deriyên hesinî de borandibûn , ji ber ku ew xwedî bawerî û nêrîn bûn , azadîxwaz û mirovhez bûn , siyaseta parta Be'is ya tek-partiyê nedipejirandin , ji şêweyên kuştin û xwînrijandinê re digotin **na** .

Bi dawîbûna kongirê re , li seranserî Sûriyê û li derve baş deng pê diket , û ev gava he dibû ciyê pesin û pîrozbahiyan . Vêca piropagandayeke xurt digel giraniyeke rêxistinî , siyasî , rengane , lihev û pirnas dihate holê û li hundir Sûriyê rê li ber xebateke berfirehtir vedibû . Lewre jî karbidestên rijîma parta Be'is , sergerm û çavsor dibûn , dest bi girtinan dikirin , da ku – xwedê giravî – karibin rê li ber liv û tevgera siyasî a demokratîk û aştiyane bigirin û devê wê bixetimînin.

Zor mixwabin ku ta niha , rê li ber rêxistinên mirovane an xwediyên wan girtiyan venebûye ku karibin wan carekê bibînin , lewre jî dixuyê ku tirseke ecêb ketiye zikê karbidestan , dilteng bûne û hurve wirve tevdîran distînin .

Careka dî jî xuya dibe ku ew nikarin guhdarî nêrîneke dî ya cuda bikin , ji gotûbêj û diyalogê re , ne amede ne , nejî pê bawerin .Û bi serde jî , bi her hawî hewil didin ku dengê hemwelatiyan û Îlan Dîmeşq bête birîn , û rola wê ya erênî û avaker di jiyan û pêvajoya civaka Sûrî de biçelmise û bête tunekirin .

Roj ji rojê baştir xuya dibe ku ev lihevkirin û piletforma Îlan Dîmeşq , çerçewake niştîmanî Sûrî demokratîk û mirovhez e , hembêza wê mezin û berfireh e , lewre jî hemî rengên civakê bi dostanî û biratî ciyê xwe tê de dibînin , çi kurd , Aşorî û Ereb , Fille , Misilmanên Sunî , yên Elewî , Isma'ilî û Durzî …HW.D. Loma jî ev pêla girtinan û tevdîrên tund li dijî liv û hebûna Îlan Dîmeşq li ba piraniya xelkê Sûrî ciyê nerazîbûn û şermezariyeke xurt bû . Daxwaza hemiyan ewe ku girtiyên siyasî û xwedî nêrîn , rojekê pêşde ji girtîgehan bêne berdan û rûpeleke nû di jiyana Sûriyê de vebe , da ku mirov wêribe û karibe bê tirs nêrîna xwe bêje û azad be.

**Sînorê Yekta**

www.arsivakurdi.org

# Saleke nû… Hêvî ne bilind

Rêberê Silîvî

**E**ve sala 2007an jî, weke salên berî xwe, kar û barê xatirxwestinê dike, da ku rê bide salake nû ji temenê vê gerdûna mezin û civaka navnetewî. Mixabin ku ev sal jî, mîna salên berî xwe li seranserî cîhanê, bi kul, êş û xwîn derbas bû. Hawîr, golên xwînê, cendekên kuştiyan, teqîn û wêran û dûman e, bi dehê hizaran zarok sêwî man, bûkên ciwan bî man, mirov di nava agir û dûmanan de qijilîn û kizirîn…!!

Pirsek serî hildide û bersivê dixwaze, ew jî eve, gelo, berê ademîzadiyê bi kû de ye?, berê wê li avakirinê yan li wêrankirinê ye?, rişim û hevsarê vê tevkuştin û xwekuştinê di destên kê de ye?.

Bêgumane ku, berdewamiya herikandina xwîna mirovan bi vê erzaniyê, karekî hovane, dirindane û kirêt e. Berê ademîzadiyê dide tarî û windabûnê. Divê herkes, nemaze aqilmend, zana û rewşenbîrên hemî gelan dengên xwe dij terorê bilind bikin, daxwaz bikin ku pirsên di navbera dewletan de, di riya diyalog, giftûgo û hevdîtinan de çareseriyê bibînin, rê nedin tu kesî, tu hêzê ku xwîna mirovatiyê birêjin, û mirov, ew tiştê herî buha û bi rûmet li ser rûçikê gerdûnê di nava agirê kîn û zikreşiyê de neşewite..!!.

Eger her kesê xwedî hêz bixwaze her tiştî bi darê zorê ji birayê xwe bistîne, wî riswa û perîşan bike, mirovatî seqet û kulek dibe, civak, hêdî hêdî bi ser civaka lawiran de diçe, yasaya dehlê ya malmîrate konê xwe vedigre, mirovatî tê perçiqandin…!! Lê, eger her mirovek mafê xwe nas bike û zanibe li hêla din, mafê birayê wî yê mirov heye, nabe ew bi ser de here, derbas bike, wê demê, aştî, biratî û dostaniya gelan şax vedide, mirovatî geş dibe, berê me û zarokên me hemiyan dikeve ronahiyê, dikev xweşî û şahiyê.

Belvkirina çanda mafê mirovan di cîhanê de, karekî pêwîst û giring e, weşandina prensîp û ramanên civaka sivîl, erk û stubarê hemî rewşenbîr, siyasetmedar, komele û çalakvanên mafên mirovan e, çimku bi weşana van nerîn û bîrbaweriyan, rikgîriya nijadî û olî ko dibe, rê li pêş mafên mirovan û dozên gelan dûz dibe.

De bila xebata hêzên demokrat li seranserî cîhanê digel xebata dezgehên mafên mirovan bi hev re bêne hûnan, mil li mil, ji bo hilweşandin û tunekirina terorê ji civaka navnetewî li ser bingeha parastina mafên mirovan û azadiya gelan.

Hêviya me ewe ku sala bê, sala azadî, aştî û wekheviyê be, sala demokrasî û rêzgirtina mirovan be, da azadîxwaz û welatparêz di zindan de nemînin, mirov ji bo nerînên xwe yên aştiyane neyên terorkirin. **30.12.2007**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org